



Çuyîna Britanyayê gelekî bi xeter e û dibe ku vê agahdarî dê jiyânê te biparêze.



Bê motor berê xwe nede Britanyayê.



Dûr ji keştiyên mêzin bimîne. Ji ber ku ew pêlên mezin derdixin û dibe ku ew keştiyan dê te nebînin.



Derya ji axê sartir e, wekî din jî ba zedetir e.



Berîya derketinê, rewşa av û hewar erê bike. Eger mij yan ba bi lez ji 10 'knots' zedetir hebe, baldar be!



Eger pêlên ku ji 0.5M bilindtir in hebin, berê xwe nede Britanyayê.



Qet ji keşti dernekeve û qet hewl nede avjenî bike!



JI BO ALIKARÎ YAN XELAS KIRIN: TELEFONÊ 112 BIKE!

Tev ku şebekê nîne, raqamê 112 divê her tim vêkirî be û bigihinê

Gavê ku tu 112 telefonê bikî, dibeje: "I am at sea and need rescue", yanî: "Ez li ser derya me û pewîstiya min ji bo alikarî heye."

Eger şebekêya Firansî li ser telefonê te hebe, telefonê 196 ji bo ku tu yekser bi 'Coastguard' a Firansî biaxive.

Vê şifre bi telefonê xwe bixwîne (skan bike) ji bo:

Agahdarî ya li ser ewlehî li ser derya û amadekarî kirin ji bona çuyîna xwe

Çawa mirov motorê keşti ya sekinî dîsa bide destpêkirin.

Agahdarî ya li ser asîle/penageh/sitare li Britanyayê

Eleqeyên giredayê av û hewar li ser deryayê 'Dover Straits' (di navbera Britanya û Fransayê)







Tev ku şebekê yan konto (pere) li telefonê te tunebin, dîşa GPS hîn kar dike û mirov hîn dikare 112 telefone bike.

1 Erê bike ku 'Location' (cih) vekiirî ye û aplikasyonekî nexşê mîna **Google Maps** vêbike.


2 Lê nîsanê 'hedef' bixe. Dibe ku ev yekê dê hinekî wext bixwazê, lê cihê te dê wekî nokteyekî şin xuya bike. Tev ku mirov li ser derya ye, dîsa ev noktê cihê te ya rast e!



3 Lê vê **nokteya şin** bixe û tilîya xwe ranake ji bo ku tu 'pin' (derzî) li ser cihê xwe dayînî.



4 Dive ku 2 raqamên direj bi navê 'koordinatên GPS' li ser ekranê te xuya bibin. Eger ew xuya nabin, jêr ve biçe heta ku tu ew 2 raqaman peyda bikî.




4 Gavê ku tu bi telefonê alikarî bixwazî, van her 2 raqaman bixwinî. **Hemu** raqam û nişan (-, ", ' °) bi rengkî hedî û zelal bixwîne.




Eger data (şebekê û konto) li ser telefonê xwe hebe, **WhatsApp** bi kar tîne ji bo ku tu cihê xwe bi rengkî hêsan parve bike.

1 Erê bike ku 'location' (cih) vekiirî ye û **WhatsApp** vêbike.


2 Mesajek bi ev kes ku tu dixwazî cihê xwe jê bişinî vêbike, û lê 'paperclip' bixe.



3 Lê nîsanê 'Location' (cih) bixe.



4 **Cihê xwe ya niha** parve bişîne, cihê xwe ya zindî neşîne!



Her tim 112 wekî destpekê telefonê bike. Eger alikarî nayê yan ku keştî ji tê vegerrandin, wê dema **tu dikarî munaznameyê Alarm Fone** ('Telefonê Awartê') jî telefonê bikî: **0033 4 86 51 71 61**

